şopdara rastiyê ye
Rônahî
Hejmar : 413 nameronahi@gmail.com 15 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Di nav çiyê de bêhna çiyê







Gerîla ji bo ku erzaqan ji hevalên xwe re bibin bar amade dikirin. Gerîlayek barê hemû gerîlayên li cem amade kir û herî dawî barê xwe amade kir. Di nav çiyê de bêhna çiyê distînim. Bêhna wan zozanên bihuştî heta bi ser kezaba min diçe. Niha hûn ê bibêjin ma di nav çiyê de bêhna çiyê mirov dikare bistîne? Biya min, erê. Hin bêhn hene nayên gotin. Gotin û yên ku wê werin ser zimên bêkêr dibin. Ti bersivekê ji bo xwe nabînin, weke bêhna çiyê ku ti bersiva xwe nabîne. Li qada Zerzanê ev bêhn girantir e. Qada Zerzanê qadeke dijwar e. Zerzan, li gorî gotinan êleke li Rojhilat e. Zahir jî serek eşîrê Zerzanê ye Her wiha ji van deran re Qebrazahir tê gotin. Eşîra Zahir bi xwedîkirina ajalan re dilebikin. Li van zozanan di navbeyna leşkerên Tirk û Zahir de şer çêbûye. Dewleta Tirk, ji bo ku ajalanên xwe li van deran diçêrandin, bacê ji Zahir dixwazin. Lê Zahir ji bo ku dibêje li ser erdên xwe bacê nade dewleta Tirk şivanê Zahir dikuje. Zahir jî li ser vê eşîrê li hev dicivîne, vê neheqiyê qebûl nake û şer dike. Di vî şerî de gelek leşkerên Tirk têne kuştin. Zahir jî tê kuştin. Ji bo vê jî ji van deran re Qebrazahir tê gotin. Niha jî gelek gorên êla Zahir li van deran e. Ev bûyer li ser zar û zimanan geriya û heta bi roja îro hat. Gerîla ev ji gundiyan hîn bûne û em jî ji gerîlayan hînî vê bûne û min hewceyî pê dît ku bi we re par ve bikim. Wiha dîrok zindî dimîne.

Hê jî li van herêman li dijî êrîşên dewleta Tirk berxwedaniyek heye û her demê lehengiyek hatiye jiyîn..Di nav van lehengan de Mezlûm, Zeynep û gelek leheng hene ku ji bo van xakan şer kirine. Lehengî ji xwe dan e. Ji xwe dan ne kar û barê her kesî ye…

Her bêhnek li qadên bihiştê min digerîne. Bi vê re carê wiha noq dibim. Belkî ya ku bîranînên min tîne bîra min û vê bêhempatiyê bi min dide hîskirin ev ve. Ji dilê min tê ku bibêjim bîranîn. Carinan hin beşîşîn dilê mirov hînik dikin. Dilê min jî wiha kutkutî. Bi her gavê re ber bi rabirduyê ve çûm û bi giranî bi hilmstaninê min gavên xwe avêtin. Bi her gavê re ber bi kûrahiyê çûm. Ev şiverê ken û ev ken leheng bi bîra min dianîn û şopeke kûr li ser mirov dihêlin…Ji dîrokê heta îro têkoşînê tim dom kir li van çiyayên asê û şoreşgerên ku van çiyan hembêza xwe ji wan re vekirin..

Watedar e ku mirov di van rêyan de, ya ku ev leheng tê re meşiyane, bimeşe û pê li van çiyan bike ku lehengan ew bi nav û deng kirine. Ji bo vê jî ji bo her gava xwe ya li van çiyan û şiverêyan xwe pir bisiûd dibinim. Carinan li pey xwe dinerim, çi vîneke mezin e jiyana li van deran û çendî li van xakan tê tişta ku li van deran tê jiyîn.

Mijarek heye ku bala min dikişine. Jiyana gerîlayên ku mirov hijmetkarî wan dibe û jidiliya wan. Bi rastî jidilî çiye? Paqijî ye, hezkirin, dilsozî, belkî jî razeke ku hê min nav lê nekiriye. Ew pir hij hev dikin û hij vê jiyana xwe. Fedekar in. Gerîla ji bo ku ji hevalên xwe re erzaqê bibin bar amade dikirin. Gerîlayekî barê hemû gerîlayan amade kir û herî dawî barê xwe. Barê xwe ji yê gerîlayên din 3 caran zêdetir girantir kir. Vê fikreke kûr bi min re çêkir. Hijêkirin ne ev e? Ne ji xwe dan e? Ji xwe dan fedekarî ye. Ti kes ne ji bo xwe be tiştekî nake. Lê gerîla herî pir ji bo hevalên xwe dikin. Hez jêkirin û jiyan ev e. Bêyî ku mirov li benda tiştekî be jiyana ji kûr ve ye hezkirin…Hez jêkirin ji xwe bêhtir keda ji bo yên dî ye...*Sara XWÎNDA*

## Kargeha Vîna Jinan amadekariyên zivistanê dike



Kargeha Vîna Jinan li kantona Kobanê bi tevlêbûna 10 jinan di çarçoveya xebatên amedekirina pêdiviyên zivistanê de dest bi kar kiriye.

Kargeha Vîna Jinan ku sala par ji bo amedekirina pêdiviyên zivistanê hatibû vekirin, ev mehek e dîsa dest bi xebatên xwe kiriye.

Di kargehê de 10 endamên jin ên kantona Kobanê dixebitin, kargeh jinên ku pêwîstiya xwe bi kar heye, deriyê xwe jê re vedike û wan di kar de bi cih dike. Bi taybet jinên ku xwendina wan tune ye û nikarin cihê xwe di tu saziyan de bigirin, dikarin cihê xwe di vê kargehê de bigirin û pêwîstiyên xwe yên jiyanî bi dest bixin.

Heta niha jinên kargehê gelek pêdiviyên zivistanê amade kirine, wekî dimsê firingiyan, firingiyên hişkkirî, fasuliyên hişk, nok, bezêla, pel, kundir û bacanên hişkkirî, reçela mişmişan û reçela kerezê, her wiha wê gelek tiştên din jî di demên pêş de amade bikin.

Hesabgira Kargeha Vîna Jinan Şêrîn Hacî têkildarî xebata kargehê axivî û wiha got: “Me ev kar bi taybetî ji bo jinên ku xwendina wan tune ye û nikarin di tu saziyan de kar bikin, vekir û em dixwazin hemû jin cihê xwe di nava vê xebatê de bigirin.”

Her wiha xebatkara bi navê Fatma Ehmed anî ziman ku xebata wan baş diçe û kêfa wan ji kar re tê û ew bi karê destê xwe pêwîstiyên xwe yên jiyanî bi dest dixin...*ANHA*



şopdara rastiyê ye
Rônahî
nameronahi@gmail.com Hejmar : 413 15 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

**Koçber di bin şertên zehmet de dijîn** *R-6*



# 14’Ê TÎRMEHÊ ROJA RÛMETA NETEWÎ YE

*Bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê û pê re êrîşên têk birinê jî dest pê kirin. Armanca darbeya faşîst ya 12’ê Îlonê jî têkbirina Tevgera Azadiyê bû. Beşek mezin ji Kadroyên Pêşeng yên PKK’ê ku hatin girtin di zîndana Amedê de li dijî faşîzmê berxwedaneke bê hempa nîşan dan û rûmet û nasnameya gelê Kurd parastin.*



### BANGA TÊKOŞÎNA LI DIJÎ FAŞÎZMÊ

Di 14’ê Tîrmeha 1982’an de kadroyên pêşeng yên PKK’ê Kemal Pîr, Xeyrî Dûrmûş, Akîf Yilmaz û Elî Çîçek li hember zilma dagirkeriya dewleta Tirk çalakiya “Rojiya Mirinê ya Mezin” dest pê kirin. PKK’ê bi boneya 36’emîn salvegera 14’ê Tîrmehê li dijî faşîzmê banga berxwedana giştî kir. PKK’ê got, “14’ê Tîrmehê roja rûmeta neteweyî ye.” *R-2*

### 14’Ê TÎRMEHÊ SERKETIN MISOGER KIR

Komîteya Zîndanê ya PKK û PAJK’ê jî bi boneya salvegera 36 an ya Berxwedana Rojiya Mirinê ya Mezin a 14’ê Tîrmehê daxuyaniyek da û got, “Di 14’ê Tîrmehê de netewa Kurd bû xwedî rûmet. Rastiya PKK’ê ya ku naşikê beriya 36 salan hat ragihandin. Roja ku rojiya mirinê ya mezin dest pê kir, serketin jî misoger bû.” *R-4*

## Serhed xwediyê mûzîka afrîner bû



Hunermendê bi nav û deng Hozan Serhed tevî ku 20 sal li ser şehadeta wî re derbas bû jî lê mûzîka ku wî afirandiye nûjeniya xwe diparêze. Hozan Serhed reng û stîleke nû beşdarî mûzîka Kurdî kir. Ew bi stranên xwe bû dengê şoreşa Kurdistanê. *R-7*

## Dayîka Ewaş çi dît û çi nedît

Yek ji mirovên herî temendirêj di cîhanê de yek jî dayîka Ewaş Baqî ye. Temenê dayîka Ewaş 120 sale û niha li Kobanê dijî. Dayîka Ewaş ya ku di nava temenê xwe yê dirêj de şahidî ji gelek buyeran re kiriye diyar kir ku sedema temendirêjiya wê jiyana xwezayî ya li gund e. *R-3*



## Pêşî dest û lingên wî jê kirin û paşê kuştin



Zilm û wehşeta leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk yên li Efrînê her diçe zêde dibe. çeteyên dagirker welatiyê 70 salî yê ji gundê Beradê yê girêdayî navçeya Şêrawa Hemdî Ebdo revandin, dest û lingê wî jê kirin û paşê jî ew bi hovane kuştin. Gundiyan cenazeyê Hemdî Ebdo li nava zeviyekê dîtin. *R-2*


## Eger Iraq û Sûriye bixwazin em ê vekişin!

Şêwirmendê lîderê olî yê Îranê Elî Xamaney Alî Ekber Welayetî li Moskovayê civîneke çapemeniyê li dar xist û got: “Hebûna Îran û Rûsyayê li Sûriyê ew e ku welêt ji komên terorîst û êrîşên Emerîkayê biparêze.” Welayetî got: “Ne bi zexta Emerîka an jî Îsraîlê, eger hikumetên Iraq û Sûriyê bixwazin em amade ne ku tavilê ji wan welatan vekişin.” *R-2*

## Rejîmê navenda bajarê Der’a yê xist dest

Li gorî nûçeya ajansa nûçeyan a fermî SANA’yê, leşkerên rejîmê li meydana herî mezin a li navenda bajarê Der’a yê ala Sûriyê daliqandine. Hate ragihandin ku hêzên rejîma Sûriyê, herêmên bajarê Der’a yê yên di destê komên ‘mûxalîf’ de bûn, bi temamî kontrol kiriye. *R-2*

## Bila deriyên Îmraliyê bên vekirin



Fikarên derbarê jiyan û ewlehiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de her diçe zêdetir dibin. Xwîşk û birayên Ocalan diyar kirin ku çav û guhê mîlyonan kesî li Îmraliyê û gotin, “hemû serlêdanên me yên hevdîtinê bi sedemên vala tên red kirin. Fikarên me derbarê jiyana Ocalan de zêde dibin. Bila deriyên Îmraliyê bên vekirin.” *R-4*

## Wê Îranê ji Sûriyê derxînin




Endamê Desteya Siyasî ya MSD’ê Hikûmet Hebîb diyar kir civîna ku wê di navbera Trump û Pûtîn de pêk were, wê rewşên nû li Sûriyê bi xwere derxîne holê. Hebîb wiha got, “Diyar e ku di navbera Emerîka û Rûsyayê de lihevkirin heye bi vê yekê jî dixwazin Îranê ji dosya Sûriyê derxînin. Rûsyayê ev soz daye Emerîka û Îsraîlê.” *R-4*

## Li ser Firatê danûstandin hene



Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk MSD’ê Îlham Ehmed ji bo ku karmend û pisporên Bendava Feratê vegerin bi rêveberiya bendavê re bixebitin dan û standin di navbera berpirsên rêjîmê û rayederên rêveberiya herêmî ya Tepqayê de hene. Ehmed got, “xêr û berên Sûriyê yên hemû gelên Sûriyê ne û mafê her kesî ye sûdê jê bibîne.” *R-5*

## 29 sale kujerên Qasimlo nehatine darizandin



Lîderê Kurd Dr. Ebdirrehman Qasimlo di 13’ê Tîrmeha sala 1989’an li Paytexta Awusturya Viyana yê dema tevî du hevalên xwe bi rayedarên rêjîma Îranê re hevdîtin dikir hat kuştin. Tevî ku 29 sal li ser sûîqesta Qasimlo re derbas bû lê hê jî kujerên wî nehatine darizandin. *R-5*

## Li Dêra Zorê 26 DAIŞ’î hatin kuştin

*R-2*

## Gêrîlla lê da, 6 leşker hatin kuştin

*R-2*

# 14'ê Tîrmehê xeta berxwedanê temsîl dike

***Di 14'ê Tîrmeha 1982'an de kadroyên pêşeng yên PKK'ê Kemal Pîr, Xeyrî Dûrmûş, Akîf Yilmaz û Elî Çîçek li hember zilma dagirkeriya dewleta Tirk çalakiya "Rojiya Mirinê ya Mezin" dest pê kirin. PKK'ê bi boneya 36'emîn salvegera 14'ê Tîrmehê li dijî faşîzmê banga berxwedana giştî kir. PKK'ê got, "14'ê Tîrmehê roja rûmeta neteweyî ye."***

Komîteya Rêveber a PKK'ê ji bo berxwedana 14'ê Tîrmehê got, "Roja Rûmeta Neteweyî" û li dijî faşîzmê ji bo berxwedana topyekûn bang kir.

Komîteya Rêveber a PKK'ê bi wesîleya salvegera 36'an a Rojiya Mirine ya Mezin a 14'ê Tîrmehê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

### ROJA RÛMETA NETEWEYÎ

PKK'ê Berxwedana Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê ku rê li ber berxwedana azadiyê ya Kurdistanê vekir, careke din silav kir û got, "Em vê Roja Rûmeta Neteweyî li Rêber Apo, hemû hevrêyên xwe û gelê xwe pîroz dikin, di şexsê afirînerên berxwedana mezin Mihemed Xeyrî Dûrmûş, Kemal Pîr, Akîf Yilmaz û Elî Çîçek de şehîdên xwe yên têkoşîna azadiyê bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin. Em careke din dibêjin ku li ser xeta berxwedanê ya 14'ê Tîrmehê em ê li ser şopa şehîdên xwe heta serketinê bimeşin.

Tê zanîn ku biryara berxwedana dîrokî ya ji bo têkoşîna azadiyê ya Kurdistanê ya hemdem, li Zindana Amedê ji aliyê hevrê Mazlûm, Xeyrî û Kemal ve hatiye dayin. Weke gel û tevger, ev sih û şeş sal in em li ser bingeha vê berxwedana dîrokî dimeşin û bi ser dikevin. Sih û şeş sal in hemû destketiyên bi navê azadî û hebûna Kurdan li ser bingeha vê xetê di nava têkoşînê de tên afirandin. Lewma bandora baldarî û sewqkirinê ya berxwedana mezin îro jî bi rengekî zindî dewam dike. Xet û ruhê serketinê yê 14'ê Tîrmehê îro jî rêya me ronî dike.

Weke ku tê zanîn, Berxwedana



Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê ya li Zindana Amedê hate kirin, yekemîn çalakiya mezin e ku li dijî darbeya leşkerî-faşîst a 12'ê Îlona 1980'î hatiye kirin û ji aliyê îdeolojîk ve ew têk biriye. Lewma berxwedana li dijî faşîzmê, ruh, xet, wêrekî û fedakarî û rêbaza serketinê temsîl dike. Nîşanî me dide ku berxwedana li dijî faşîzmê divê çawa be û rêya serketinê radixe pêş çavan. Xeta berxwedana fedayî ya partiya me ya li dijî faşîzmê eşkere kiriye. Ji aliyê Rêber Apo ve weke 'Çalakiyeke têrker û yekgirtî ya ku xeta berxwedanê ya partiya me temsîl dike' hatiye nirxandin û pênasekirin.

Li dijî êrîşên faşîst ên 12'ê Îlonê, 14'ê Tîrmeha 1982'an li zindanê û 15'ê Tebaxa 1984'an li çiyê çi hatibe kirin, îro jî tevgera me, gelê me û hemû hêzên şoreşger-demokratîk li dijî êrîşên faşîst ên AKP-MHP'ê li her qadê heman tiştî dikin. Li dijî êrîşên faşîst-qirker ên topyekûn, berxwedana azadiyê ya topyekûn tê kirin.

Li ser vê bingehê em Berxwedana Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê careke din silav dikin, bang li hemû hevrê û gelê xwe dikin ku li dijî faşîzma AKP-MHP'ê xwe di xeta serketinê û berxwedanê ya 14'ê Tîrmehê de bêhtir bi rêxistn bikin, hîn bi xurtî têbikoşin û serketineke mezin bi dest bixin."

## Pêşî dest û lingên wî jê kirin û paşê kuştin

Çeteyên Artêşa Tirk a dagirker çend roj berê kalê bi navê Hemdî Ebdo revandibûn, dest û lingên wî jê kiribûn û paşê kuştibûn. Şêniyên gundê Beradê yê navçeya Şêrawa ya Efrînê cenazeyê Hemdî Ebdo dîtin.

Çeteyên bi navê Ketîbet El-Hemzat a girêdayî Istixbaratên Tirkiyê di roja 7'ê Tîrmehê de girtin ser mala kalepîrê 70 salî yê bi navê Hemdî Ebdo yê li gundê Beradê ya navçeya Şêrawa ya Efrînê. Hevjîna wî Sultana Xelîl Nasiro ya 70 salî qetil kirin. Hate gotin ku serçeteyê bi navê Ebû Elî Heyanî Sultana qetil kir. Paşê



jî Hemdî revandin û birin cihekî ne diyar. Ji wê rojê ve Hemdî tu agahî ji Hemdiyê 70 salî ne hat girtin. Roja 13'ê mehê gundiyan cenazeyê Hemdî Ebdo di nava zeviyên gundê Beradê de dîtin.

Li gor ajansa ANHA'yê çavkaniyên ji gundê Beradê diyar kirin ku cenazeyê Hemdî Ebdo dest û lingên wî jê kirî hate dîtin. Heman çavkaniyan diyar kirin ku çeteyan dema Hemdî Revandin 7 milyon lîreyên Sûriyê û 1 kîlo zêr, her wiha 10 çêlekên wan dizîn.

Hat ragihandin ku cenazeyê Hemdî Ebdo hîn li cihê xwe ye û çeteya rê nadin tu kes cenaze rake.

## Rejîmê navenda bajarê Der'a yê xist dest




Hate ragihandin ku hêzên rejîma Sûriyê, herêmên bajarê Der'a yê yên di destê komên 'mûxalîf' de bûn, kontrol kiriye.

Li gorî nûçeya ajansa nûçeyan a fermî SANA'yê, leşkerên rejîmê li meydana herî mezin a li navenda bajarê Der'a yê ala Sûriyê daliqandine. Hate ragihandin, leşkerên rejîmê beriya niha hemû semtên di destê komên 'mûxalîf' de bûn, kontrol kiribûn.

Li gorî nûçeya ajansa nûçeyan a Fransayê AFP'ê jî li taxeke li başûrê bajêr konvoya ji polîsên leşkerî yên Rûs û wesayitên ji efserên Sûriyê hatine dîtin. Di nûçeyê de hate gotin, leşkerên Rûs û Sûriyê çûne seremoniya daliqandina alê ya li navenda bajêr.

Ji bo Der'a û derdora wê, roja 6'ê Tîrmehê li hev hatibû kirin û bi vê peymanê re kontrola herêmên li nava wîlayetê radestî rejîmê hatibû kirin.

## Cerdevanan 3 bira kuştin!




Muslum Toraman û kurên wî ku li Rihayê cerdevan in, Zekî, Zûrat û Îmam (Salih) Bogakça ku birayê hev in, kuştin.

Li Taxa Çerxê ya navçeya Eyyûbiye ya Rihayê, Muxtarê Taxa Hêcek a navçeya Pirsûsê, cerdevan Muslum Toraman û 2 kurên wî yên cerdevan, ên li taxa Çerxê zevî kirê kiribûn, bi hinceta avdaniyê bi birayên Bogakça yên ji goma Golcuk a Taxa Eskîce ku wan jî li herêmê zevî kirê kiribûn re nîqaş kirin. Nîqaş roja 12'ê mehê di saetên şevê de dest pê kir, di demek kin de veguherî şerê bi çek. Zekî, Murat, Îmam (salîh) û Ahmet ên di êrîşa cerdevanan de birîndar bûn, rakirin nexweşxaneyên cuda yên Rihayê. 3 birayên hev Zekî, Îmam û Murat Bogakça yên rakirin nexweşxanê jiyana xwe ji dest dan û rîska jiyana Ahmed ê bi giranî birîndar jî berdewam dike.

## Gêrîlla lê da, 6 leşker hatin kuştin



Gerîlayên HPG'ê li gelek herêman li dijî artêşa dagirker a Tirk çalakiyên sekvanî û sabotajê kirin. Li Colemêrg, Şirnex û Mêrdînê di çalakiyan de herî kêm 6 leşker hatin kuştin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand.

HPG'ê da zanîn ku hêzên gêrîla çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de li Colemêrg, Şêrnex û Mêrdînê li dijî artêşa TC a dagirker çalakî li dar xistin. HPG'ê da zanîn ku di van çalakiyan de 6 leşkerên Tirk hatine kuştin û hêjmarek zêde jî birîndar bûne.

12'ê Tîrmehê saet 07:30'î hêzên me yên YJA Starê li dijî leşkerên li ser girê Şehîd Elîşêr ê li navçeya Geverê çend çalakiyên sekvaniyê kirin. Di çalakiyan de 2 leşkerên dijmin hatin kuştin.

## Li Dêra Zorê herî kêm 26 DAIŞ'î hatin kuştin

Di êrîşa hewayî ya li dijî çeteyên DAIŞ'ê yên li Dêra Zorê ya dikeve rojhilatê Sûriyê de herî kêm 26 çeteyên DAIŞ'ê hatine kuştin.

Mala Çavdariya Mafê Mirovan a Sûriyê ragihand ku li derdora bajarokê Sûsa ya nêzî sînorê Iraqê li dijî çetyên DAIŞ'ê êrîşeke hewayî pêk hatiye. Mala Çavdêriyê diyar kir ku nizanin bê ka êrîş ji aliyê hêzên hewayî ya Iraqê yan jî koalîsyona navneteweyî ve hatiye kirin.

Mala Çavdêriyê bibîr xist ku di êrîşê de herî kêm 26 çete hatine kuştin, di bîlançoya beriya niha de jî ragihandibû ku 28 sivîl hatibûn kuştin.

### DI NAVA ÇEND HEFTEYAN DE WÊ DAIŞ TÊK BIÇE

Li aliyê din general Frederîc Parîsot ê nûnerê Fransa yê di koalîsyona navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê de anî ziman ku wê di nava çend hefteyan de DAIŞ li rojhilatê Sûriyê weke hêza leşkerî nemîne.

Parîsot got: "Du cihên biçûk mane û ez dikarim bi awayekî vekirî bêjim di nava çend hefteyan de, bi opersyonên li dijî DAIŞ'ê wê ti herêm nemîne di bin kontrola wê de. Şerê li navîna Firatê wê heta dawiya havînê bi dawî bibe."

## Eger Iraq û Sûriye bixwazin em ê vekişin!


Şêwirmendekî lîderê olî yê Îranê Elî Xamaney got, eger Bexda û Şam bixwaze ew ê 'şêwirmend'ên xwe yên leşkerî tavilê vekişînin.

Alî Ekber Welayetî li Moskovayê civîneke çapemeniyê li dar xist û ev îdîa kir: "Hebûna Îran û Rûsyayê li Sûriyê ew e ku welêt ji komên terorîst û êrîşên Amerîkayê biparêze."

Welayetî got: "Ne bi zexta Amerîka ya jî Îsraîlê, eger hikumetên Iraq û Sûriye bixwazin em amade ne ku tavilê ji wan welatan vekişin."

Serokwezîrê Îsraîlê Benyamîn Netanyahû roja Çarşemê ji Serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn re got, sedemeke ku Beşar Esad ji Îsraîlê bitirse nîne. Netanyahû ji Pûtîn xwest, hêzên Îranê ji Sûriyê derkevin.

Alî Ekber Welayetî da xuyakirin ku ji bo pozîsyona leşkerî ya Îranê ya li Sûriyê diyar bikin, ew bi Moskova û Şamê re di nava koordîneyekê de dixebitin.





# Serhed xwediyê mûzîka afrîner bû

***Hunermendê bi nav û deng Hozan Serhed tevî ku 20 sal li ser şehadeta wî re derbas bû jî lê mûzîka ku wî afirandiye nûjeniya xwe diparêze. Hozan Serhed reng û stîleke nû beşdarî mûzîka Kurdî kir. Ew bi stranên xwe bû dengê şoreşa Kurdistanê.***

Hozan Serhed bi navê xwe yê rast Silêman Alpdogan di sala 1970 de li bajarê Agirî tê dinê. Di roja 12'ê Tîrmehê li herêma Faraşînê tevlî karwanên şehîdan dibe. Hozan Serhed hunermendekî bi nav û deng û şehîde tekoşîna azadiyê ye. Hozan Serhed bi muzîka xwe ya cuda ku pêşxistin reng, rih û stîleke cuda da mûzîka Kurd. Serhed di warê muzîkê de xwedî qabiliyet û afrîneriyeke cuda bû. Tembûra wî tenê weke orkestrayekê bû. Stranên wî yên weke Hewlêr, Mizgîna Leheng, Sema Yuce hê jî di roja îro de bandoreke mezin li ser her kesî dike.

Silêman Alpdogan ji du xwîşk û sê birayan ê herî biçûke. Serhed, zarokatî û ciwantiya xwe li navçeya Agirî Patnosê derbas dike; heya dibistana navîn li vir dixwîne. Hîn di 7 salîya xwede bala wî diçe li ser tembûrê.

Di salên 1985-1986'an de ku du sal di li ser dest pêk kirina şerê çekdarî ya têkoşîna neteweyî ya Kurdistanê ra derbas dibe, têkoşîn germ û berfireh dibe. Li hemberî vê, şaxa şerê taybet ê Tirkiyê jî vala nasekine û taktîkan diafirîne. Di encama vê yekêde li Tirkiyê û Kurdistanê furyaya hozanên zarok dest pêk dike. Bi vî awayî ciwanan ber bi wî alî de dikişînin. Serhed jî wê demê ne di zanîna neteweyîde ye û dikeve nav vê bazarê. Ew ji bo ku kasêta xwe ya yekemîn derxîne diçe Stenbolê û li wir bi navê Murad Esen kasêta bi navê Gulo derdixe. Di heman demê de yek ji wan hozanên biçûk jî Emrah e. Silêman demekê bi Emrah re li malekê dimîne lê paşê vedigere Patnosê. Ew di sala 1988'an de dikeve ezmûnê û Konservatuara Dewletê ya Zanîngeha Ege beşa Muzîka Tirkî qezenc dike. Salên konserwatuarê ji bo wî dibin salên xwe lêpirsînkirinê û li xwe vegerînê. Ew li vir giranîyê dide nîqaşên li ser di rastîya Kurdistanê de divê asta huner û hunermend çi be.

Li zanîngehê ew û jineke bi navê Yıldız hev û du nas dikin û di sala 1991'ê de dizewicîn. Di tîrmeha heman salê de jî her du beşdarî nav refên Têkoşîna Azadiya Kurdistanê dibin. Yıldız, li Cizîrê tê girtin û



12 sal û 6 mehan cezayê zîndanê lê tê birîn. Silêman jî pêşî diçe Heftanînê ji wir jî derbasî Akademiya Mahsum Korkmaz dibe. Ji wir ji ber mamosta bûna wî ya di warê muzîkê da wî dişînin Hunerkomê. Li vir di nav Koma Berxwedan de dixebite.

Li Ewropayê ji bo xebata muzîkê her çiqas derfet hebûn jî wî di got şoreşgerek divê vegere welatê xwe, ev ji bo şoreşger peywireke û wiha digot: "Çavkanîyeke me ya hêja heye. Vegera li ser wê çavkanîyê bi taybetî derxistina çanda Kurdî, peywireke me ye."

Hozan Serhad daxwazên xwe pêk tîne û di sala 1996'an de vedigere ser çavkanîyê. Piştî ku çend mehan li Zapê dimîne, diçe Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Hewlêrê. Li vir hema li her deverên Başûrê Kurdistanê beşdarî dawet û şahîyan dibe.

### PÊVAJOYA BEŞDARBÛNA PKK'Ê

Hozan Serhed ji sala 1998 an pê de bi nav şer de cih digire. Di Sibata 1999 an de beşdarî Komcivîna 6'emîn a PKK ê dibe. Ew di komcivînê de, ji bo karên Ewropayê tê peywirdarkirin, lê ji ber ku bi komloyeke navdewletî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dîl tê girtin, dixwaze ku çûyîna wî bê peş xistin. Di komcivînê de her wiha bîryar tê dayîn ku koma ku derhêner Xelîl Uysal jî di navê de cihê xwe digire herin herêma Botanê. Hozan Serhed jî ji bo kişandina klîban, dixwaze bi wan ra here.

### ŞEHADETA WÎ

Hozan Serhed tevî yekîneya xwe di tîrmeha 1999'an de li Elkê, Colemêrgê dikeve kemîna artêşa Tirk. Ew ji komê vediqete lê bi birîndarî dikeve destê dijmin; di vê pêvajoyê de li hemberî zordarîyê li serî radike. Hozan Serhed di roja 10'emîn a dîlketinê de li Faraşînê derdixin operasyonê û Serhed li wir dikeve nav karwanên şehîdan.

## Şitla baxçê azadiyê: Elî Temel

Li Zindana Amedê Elî Temel bi textikek û tayê gorê ji xwe re tembûrek çêkirî strana 'Va ye PKK rabû' çêkir. Çîroka vê stranê ku mohra xwe li dîroka 35 salan a Kurdan daye.

### ÊŞKENCEYA 120 ROJAN

Elî Temel 1960'î li Dêrika Mêrdînê, li gundê Girêsor tê dinê. Hê di zaroktiyê de rastiya Kurdan nas dike. Pêşengên PKK'ê Xeyrî Durmuş û Ferhat Kurtay nas dike, dikeve bin bandora wan û dibe Apocî.

Temel 27'ê Çile ya 1980'yî tê destgîrkirin û 120 rojan dimîne. Lê ferz dikin ku li hevalên xwe bide, qebûl nake û êşkenceya demdirêj dest pê dike.

Elî Temel piştî 4 mehan li Girtîgeha Girtî ya Mêrdînê dimîne dişînin Zindana Amedê.

### PIŞTÎ WÊ ŞEVÊ

Çîroka strana 'Va ye PKK rabû' digihe heta bi zindana Amedê. Elî yê ku 17 saliya xwe Apociyan nas dike êdî herî pir 20 salî ye. Bi Kemal Pîr, Xeyrî Durmuş û Elî Çîçek re di nav berxwedanê de ye. Wan rojên tarî yên zindanê bi Ferhat Kurtay re di koxuşa 33 kesî de dima. Kurdî ji bo Elî azaweriyek bû. Digot, ''tenê bi Kurdî dikarim hilma xwe bistînim''. Wê serdema hovîtiyê bi Ferhat re Kurdî hînî hevalê xwe yê koxuşê dikir.

18'ê Gulana 1982'yan Ferhat û sê hevrêyên wî dema ku bedena we dane ber êgir Elî jî li wir bû.

### VAYE PKK RABÛ

Elî li zindanê yek ji kesê herî hilberîner bû Tim dinivîsî. Mehmet Îsa Kizil ku bûbû şahid strana 'Va ye PKK rabû' wiha behs dike: ''Elî digote min, ''Ez ê helbestê binivisim. Tu jî alîkariyê bike, ahenga wê em bi hev re zevt bikin''. Me tayên naylonî yên gorên xwe jêkirin. Piştre me ev tayên naylonî li teşiyekî gerand û ev ta me kire têlên tembûrê. Elî ev texteyê ku li girtîgehê ditî li qotiya şoker monte kir, tayên naylonî yên gorê me pê ve girêda. Piştre jî nota û perdeyên tembûrê çêkir.

Elî dema ku li vê amûrê xist dengê tembûrê jê derket. Bi tembûra xwe gotinên strana 'Va ye PKK rabû' dinivîsî û digot. Min jî ev gotin dubare dikirin. Elî wiha gotinên stranê temam kir. Dema ku me ev stran gotî weke ku hemû dinya dibû ya me em kêfxweş dibûn.''

Elî Temel strana xwe ya 'Va ye PKK rabû' bi tembûra xwe ji hevalê xwe yê koxuşê re digot, guhdarvanên wî yên pêşî hevrêyên wî yên berxwedêr bûn. Pir ji stranê hez dikirin.

Elî digot, ''Ez ê vê stranê bişînim derve. Dema ku derkete derveyî girtîgehê wê pir were ecibandin, hûn ê bibînin.''

Elî şaş nedibû. Ji Amedê ta Botan, Zagrosê ev 35 sal in Kurd bi vê stanê mezin dibin.

Elî bi gotinên vê stranê bi morala ku ji çalakiya 15'ê Tebaxê ya ser Dihê û Şemzînanê nivîsîbû.

Li çiyê şerê gerîla geş bûbû, li gund û navçeyên Kurdistanê gel rabûbû serhildanê û dewleta Tirk gelekî tengav bûbû. Soza Elî hebû ji bo Ferhat, Kemal û Hayrî. Bi cihgirtina li nava saziyên çandê yên Kurd re ew soza xwe bi cih anî.

Bêguman Elî Temel bi muzîk û stranên xwe bû yek ji hunermendên girîng ku di hunera şoreşgerî ya Kurd de rê li ber pêvajoyeke nû vekir.


Ji stranên Elî Temel albûma destpêkê ya Koma Çiya bi navê "Rozerîn" sala 1991'ê derket. Strana 'Şitla Azadî' ya li ser Ferhat Kûrtayan nivîsandî bû strana serhildanê.

### BERÊ XWE DA ÇIYÊ

Elî berê xwe da çiyê û li çiyê şer kir.

Sala 1992'an dema ku ji bo bibe gerîla bi rê ket, pênûs û tembûra xwe jî bi xwere bir. Di pîrozbahiyên 15'ê Tebaxê yên heman salê de li Akademiya Mahsûm Korkmaz bi tembûra xwe derket pêşberî namzetên nû yên gerîla.

Piştî perwerdeya leşkerî berê xwe da cih û warê lê ji dayik bûye, çû Mêrdînê. Pênûs û tembûra wî li wir jî timî pê re bû. Bi wê Kurdiya xwe ya bedew helbest nivîsî û bi skêçên xwe dilê gerîla xweş kir.





13'ê Tîrmeha 1994'an li Şemrexê di şer de birîndar bû. Ji aliyê Fermandarê Jendermeyan ê wê demê Hasan Atîlla Ûgûr ve hate şehîd xistin.

### BI ŞITLA AZADÎ HATE VEŞARTIN

Malbatê ji bo cenazeyê Temel bibîne bi salan li ber xwe da. Herî dawî sala 2014'an hestiyên Elî dîtin. Piştre ji bo Elî merasîmeke bi heybet hate kirin. Bi hezaran kes li Goristana Girê Bîrê ya Qoserê bi strana 'Şitla Azadî' Elî oxir kirin. Û axa cihê ku Elî lê hate şehîd xistin, li ser gora wî hate reşandin.

Elî Temel li pey xwe stranên bedew hişt û çû cem hevrêyê xwe Ferhat Kûrtay. Di ser mirina wî re 24 sal derbas bûn, stranên wî hîn jî tên guhdarîkirin…***Yenî Ozgur Polîtîka***



## Ziman û Zanist

Sîpan ŞÎNDA

Kurdî ji aliyê peyvên zanistî ve hinekî qels maye. Ya rast ne hinekî, pirr qels maye. Çima? Ji ber ku dewletek ya Kurdan nîne û ji ber wê sazî û dezgehên zanistê nînin. Sazî û dezgehên li ser zimanê Kurdî dixebitin jî derfetên wan pirr kêmin û eva henê ji bandorê li ser pêjve çûna zimanî dike. Gelik caran bi taybetî li bakûrê Kurdistanê saziyên li ser zimanê Kurdî xebatê dikin hatine girtin û rastî êrîşan hatine, xebatên wan hatine asteng kirin, xebatkar hatine girtin, weşanên wan hatine destilser kirin, çapxanê wan hatine dadan.

Li bakûr di nava van her dû salên dawî de çi sazî û dezgeh, rojname, malperên înternetê, saziyên lêkolînê û hwd hemî ji aliyê dewletê ve hatine girtin. Ji ber wê niha li bakûr hemû xebatên li ser zimanê Kurdî hatine rawestandin.

Him ziman him ji zanist du tiştên zindî ne. Her dû ji her tim xwe nû dikin û pêjve diçin. Di vê xwe nû kirin û pêjve çûnê de bandorê li ser hev dû dikin û têkiliyeka wan ya xurt heye. Her zanist pevyên nû diafirîne, termînolojiya xwe ya xweser çêdike û bi vêre ji zimanî dewlemend dike. Peyv û termînolojiya zanistî ji bo zanistê gelkî girîng e. Herweha hemî zanist jî peyvan ji zimanî distînin. Ev yeka henê ji him zanistê xurt dike him ji zimanî xurt dike. Ji ber wê her zanyar di heman demê de divê hakimê zimanê xwe yê zigmakî be ji. Zimanê Kurdî di vî warî de mixabin zêde bê siûd e. Ji ber ku di nav Kurdan de bê dewlet bûyîn heye, him zanist di nav Kurdan de nîne him ji zimanê zanistê nîne û zimanekî zanistî çênebûye. Ew Kurdên li ser zanistê xebatan dikin ji mixabin bi zimanê netewên din ango zimanê dewletên desthilatdar yê fermî dikin. Gelik kesên Kurd, zimanê wan yê zigmakî Kurdiye, ked dane zimanê Tirkî, Farisî yan ji Erebî. Van Kurdan gelik berhemên wêjeyî, zanistî dane van zimanan, lê mixabin nekarîne bi zimanê xwe binivîsin yan ji hewl nedane! Gelo ma têkiliya ziman û zanistê tenê dan û standina peyvan e? Nexê. Him zimanê zanistê çêdibe, him ji zimanekî zanistî çêdibe. Ev yeka henê ji tiştekî pirr watedare ji bo her dû aliyan. Me got her zanist termînolojiyeka xwe ya xweser çêdike. Lê ev termînolojî tenê bi serê xwe nikare zanistê vebêje. Kîj baskê zanistê be bila ew be, bi alîkariya ziman xwe digihîne civakê û mereqdarên xwe. Gelik nivîskaran pirtûk li ser zanistê nivîsîne, gelik zanyaran ji li ser zimanî nivîsîne.

Ji aliyê zimanê Kurdî, sazî û dezgehên Kurdî û herweha ji aliyê nivîskarên Kurd de, ev mijareka gelik girîng e. Mînak tiştên teknolojîk yên derdikevin, em hemiyan bi navê wan ê biyanî dixebitînin. Dîsa di warê tibbê, sosyolojiyê, psîkolijiyê, hiqûqê û hwd wisaye. Divê her nivîskarek di warê pizboriya xwe de li ser vê bisekine. Hêj yekitiya Kurdan çênebiye, lê komel û yekitiyên nivîskarên Kurd hene. Kurd PEN heye. Çi li Ewropa, çi li bakûr, çi li başûr, çi li rojava û li rojhilat be, divê weke peywireka exlaqî ya li pêjberî zimanê zikmakî û herweha li pêjberî civaka Kurd, zanyar û nivîskarên Kurd di vî warî de bikaribin vê valeya mezin dagirin. Nivîskar û zanyarên Kurd dikarin vê yekê di nava xwe de dabaş û çareser bikin.

# Koçber di bin şertên zehmet de dijîn



*Di demsala havînê de şert û mercên jiyana koçberên ku di kampên bakurê Sûriyê de ne zehmet buye. Koçberên kampa Tiwêhiniyê diyar kirin ku rêxistinên mirovî alîkariya wan nakin û dan zanîn heta niha sozên alîkariyê ku dane jî bi ci neanîne.*

Koçberên di kampa Tiwêhîniyê ya bakurê rojavayê Tebqyê de dimînin, ji sozên rêxistinên mirovî bêzar bûne. Her çend gelek soz dabin jî ku wê alîkariyê bikin lê heta niha ew soz pêk nehatine.
Bi hatina demsala havînê re rewşa hewa hat guhertin, pileya germahiyê zêde bû. Ji ber wê jî koçberên di kampa Tiwêhîniyê de dijîn, bêzar û aciz bûne. Ji ber vê yekê gelek malbat ji kampê derketin û berê xwe dan kampên din.
Di kampê de heta niha 2 hezar û 50 malbat bi cih bûne. Komeleya Rojava û Meclisa Sivîl a bajêr li gorî derfetên xwe yên heyî alîkariya koçberan dikin û pêdiviyên wan bi cih tînin. Lê ji ber hejmara zêde ya koçberan hêza wan têrê nakê.
Koçberên di kampa Tiwêhîniyê de dimînin, bang li rêxistinên navdewletî kirin ku alîkariya wan bikin. Heyva Sor a Kurd tevî derfetên xwe yên kêm û nebûna noqteyek tenduristiyê jî alîkariya koçberan dike.
Jineke koçber diyar kir ku ew dayika 8 zarokan e û destnîşan kir ku hin ji zarokên wê nexweş ketine, lê ew nikare wan derman bike û got: "Em tenê li benda rehma Xwedê ne."
Koçberê bi navê Cima El-Seîd ê ji gundewarên Hemayê ye, da zanîn ku tenê 2 komeleyên Rojava û El-Mewde pakêtên xwarinê yên mehane li kampê belav dikin, lê ew jî têra hefteyekê nakin û wiha got: "Hejmara koçberan zêde ye, alîkariyên têne dayîn jî têrê nakin."
Koçberê bi navê Ehmed El-Esîf ê ji gundewarên Humsê jî derbarê mijarê de ev tişt anî ziman: "Rêxistinên mirovî me ji bo serjimariyê kom dikin, lê piştî karê xwe qedandin, em li dû wan dibezin û tenê pişta wan ji me ve xuya dike. Em tiştekî ji wan nabînin."
El-Esîf diyar kir ku bêzariya wan ji rêxistinên mirovî yên alîkariyan zêde bûye û got: "Ji ber hovîtiya rêjîmê û ji bo parastina canê xwe em reviyan û me hemû tiştên xwe li pey xwe hiştin. Niha jî em tenê wekî hejmaran di lîsteyên serjimariya rêxistinan de ne û pêdiviyan me tenê wekî hibra li ser kaxezê dinivîsin û wiha dimîne. Alîkariya me nakin."



Koçberê bi navê Xalid El-Seyaf jî wiha got: "Rewşa me gelekî xirab e, çima tu rêxistin me wek koçber qebûl nake? Gunehên me çi ye? Tenê sebra me ji ber aramiya ku QSD'ê li herêmê pêk aniye tê, yan na em li vê derê nedisekinîn."…*ANHA*

## Rêyên Qamişlo tên çêkirin



Rêveberiya Şaredariyan a Qamişlo dest bi çêkirina rêyên têketin û derketina Qamişlo kir.
Şaredariyên Qamişlo yên Rojhilat (Şerqî) û Rojava (Xerbî), sala par rêyên têketin û derketina Qamişlo çêkirin. Lê ji ber sedemên derfetên kêm, ne pisporî û xetên avê, rê di nîvî de man. Piştî wê salekê rêyên hatin çêkirin jî xirab bûn. Ji ber toza ku havînê radibû û heriya zivistainê gelê Qamişlo bêzar dibû. Îsal piştî cejna Remezanê Rêveberiya Şaredariyên Qamişlo dîsa dest bi projeya çêkirina rêyan kir.
Hevserokê Rêveberiya Şaredariyan a Qamişlo Mihemed Hisên diyar kir ku wê rêya Rojhilatê Qamişlo 5 km û 500 metre, rêya Rojavayê Qamişlo jî 3 km û 200 metre bê çêkirin. Hisên da zanîn ku di heman demê de wê firehiya rêyan 18 metre bê çêkirin û wê xebat heya meha 11`an berdewam bike.
Mihemed Hisên diyar kir ku ew ji bo berjewendiyên gel dixebitin û got, "Rast e gel ji ber van rêyan pir mexdûr bû lê divê gel me fêm bike, em di rewşeke awarte re derbas dibin. Em di nava şerekî de ne, gelek aliyan ev pirsgirêka rêyan zivirand pirsgirêkên siyasî."
Welatiyê bi navê Ferhan Hesen ku mala wî li ser rêya Hilêliyê ye, ji bo çêkirina rêyan spasiya rêveberiya şaredariyan kir û wiha got: "Em spasiyê dikin ku we dengê me gihand rêveberiyê. Vê rêyê gelek acizî da me. Niha dest bi çêkirina wê kirine. Em hêvîdarin zû temam bibe. Em gelek spasiya rêveberiyê dikin."
Welatiyê bi navê Bengîn Ehmed Silêman ku dikana wî li taxa Um Firsan a li ser rêya Tirbespiyê ye jî keyfxweşiya xwe ya ji bo çêbûna rê anî ziman û got: "Ji ber toza vê rêyê me nedikarî dikana xwe vekin. Em pir aciz dibûn. Niha rêveberiyê dest bi çêkirina rê kiriye. Em pir keyfxweş bûn, ne tenê em gel tev keyfxweş e."…*ANHA*

## Havîn û zivistanê xaniyên kelpîç xweşin

Li herêma Tebqayê careke din lêkirina xaniyan bi kelpîçan destpêkiriye. Berê de çanda lêkirina xaniyan bi kelpîçan şêniyên herêmê heye.
Koçber û bê istîqrariya ku ev çend sal e bi ser şêniyên herêmê ve hatiye, welatî neçar kirin ku gelek caran xaniyan lê bikin û cihê xwe amade bikin. Welatî careke din lêkirina xaniyan bi kelpîçên ku ji axê têne çêkirin, pêk tînin.
Gundê Bîr Sena girdêyaî Tebqayê ye. Li vî gundî welatî jiyana xwe ya gundewar didomînin. Welatiyan dest ji qermîd û çîmentoyê berdaye û careke din xaniyên xwe bi kelpîçan çêdikin.
Welatiyê bi navê Ebdulqadir El-Hemed derbarê lêkirina xaniyên ji kelpîçan de diyar kir ku ev rêbazeke dîrokî ye û ev tişt anî ziman: "Tu kes nikare cudahiya xaniyên ji kelpîçan têne çêkirin, red bike. Mesrefa wê kêm e. Xaniyên kelpîç hênik in û zivistanan jî germ e. Kelpîç ji axê û bermahiyên qeselên genim tê çêkirin. Heriya tê çêkirin di qalib de tê rastkirin û li ber rojê tê hiştin. Paşê tê rakirin û xanî bi wan tê lêkirin."
Li Tebqayê û tevahî bajar û gundên derdora çemê Firatê lêkirina xaniyan bi kelpîçan zêde dibe. Ev jî nîşaneya wê ye ku welatiyên bi salan koçber bûbûn, niha vedigerin warên xwe…*ANHA*



### Çare



## mafxwestin

Sîpan CAN

Dibe ku li her welatekî cîhanê sazî hebin, dibe ku ev sazî heya radeyekê mafê gelek karmendên xwe diparêzin, dibe jî ku ew sazî bi kêrî tiştekî neyên. Ger ne ji sedî sed be, lê em dikarin bêjin heya astekê welatên ku saziyên wê yên civaka sivîl zêde ne asta rêxitinbûn û demokrasiyê her wiha mafê karker, karmend, mamoste, cotkar... hwd di nava xwe de, kêm zêde misogere.
Ev aliyekî mijarê ye, aliyê din ji mijarê dibe ku sazî hebin, lê asta civakê ya zanabûn û hişiyariyê nebe, taybet civakên ku nû saziyên wan çêdibin. Ji ber wê em dikarin vê bêjin " ji bo her kesayetek di civakê de bighê mafê xwe divê têkiliya wî û saziya xwe gelek xort be, ango hev û din temam bikin û kî çi erk li ser milê wî/wê heye pêk bîne" bi gotinek din sazî berpirsyarê endamê xwe ye û endam di ber saziyê xwe de berpirsiyar e.
Ji bo me, wek Rojava û bakurê Sûriyê hîn jî ev mijara baş ne hatiye rûniştandin. Yek jê sedem sazî bi xwe ye û ya din jî kesayet bi xwe ye. li gorî isûlê, çi sazî dibe, erka wê ye mafê endamên xwe pê bide nasîn, li gorî yase û qanûnan karibe di cihê biriyarê de zagonên xizmetî mafê endamên xwe dike pêşniyar bike û duvre bighîne encamê. Her wekî din sazî mîna her weletakî cîhanê bibe bingeha biryargirtinê û diyarkirina çarenûsa civak û di nav de kesayet. Belkî bi giranî me behsa kesyet û mafê wî/wê kir; lê divê bê zanîn ku mafê civakê nebe û ev civak nizanibe mafê wî di kude ye û çawa dikare bistîne wê ferd jî nizanibe berê xwe bide ku. Ji ber vê yekê sazî ne tenê berpirsiyare di ber kesekî/ê de, sazî di bingeha xwe de peywira herî mezin ji bo avakirina civakê dikeve ser milê wê. Lê; bi qasî ku saziyên di hundir xwe de kilît bûne û xetemîne, nikarin ne ji bo xwe û ne jî ji bo civakê çareseriyan bibînin. Slogana herî zêde tê avêtin jî " derfet û îmkan nînin" ma gelo derfet tenê bi tiştên madî tên pîvandin?
Em werin ser kesayet, ferdên civakê jî di serî de di ber xwe de berpirsiyarin û di ber mafê xwe de divê baldar û hişiyar bin. Gelek ji me rastî binpêkirinan di derbarê maf de tên, lê; mixabin em nizanin bê ka saziya me dikare vî mafî ji me re bistîne an na. An jî, divê ez bi çi rê û rêbazê mafê xwe bistînim. Lewra, dibe ku insiyatîfa saziyê lawaz be, kesayet dikare wê demê bibe xwedî insiyatîf, bila ew jî carekê ji bo ku mafê xwe bistîne tev bigere. Di encamê de ew ê bikaribe ne ji bo xwe tenê, wê ji bo hemû yapiya tê de kar dike bibe elementekî bi bandor.
Di encamê de mirov dikare vê yekê derxîne holê, eger maf tenê ji bo kesayetekî/ê bê standin pirsgirêkên me çareser nabin. Tekez divê ferdên civakê ji bo misogerkirina mafên xwe, tenê bi ezezî nefikrin û ji bo gîştî bixebitin, wê demê her kesê bighêje mafê xwe(yek ji bo hemû, hemû ji bo yek).



# Dayîka Ewaş jî çi dît û çi nedît

***Yek ji mirovên herî temendirêj di cîhanê de yek jî dayîka Ewaş Baqî ye. Temenê dayîka Ewaş 120 sale û niha li Kobanê dijî. Dayîka Ewaş ya ku di nava temenê xwe yê dirêj de şahidî ji gelek buyeran re kiriye diyar kir ku sedema temendirêjiya wê jiyana xwezayî ya li gund e.***

Yek ji mirovên temendirêj dayika Ewaş Baqî di 120 saliya xwe de hê jî li gundekî Kobanê dijî û diyar dike ku sedema temendirêjiya wê jiyana gund e.
Li gundê Girdê yê kantona Kobanê dayika bi navê Ewaş Baqî yek ji kesên temenmezin e û di 120 saliya xwe de hê jî jiyana xwe didomîne.
Ewaş Baqî di sala 1898'an de hatiye dinyayê û niha di nava mirovên herî temenmezin de cih digire. 7 zarokên Ewaş Baqî hene û kurê wê yê mezin 80 salî ye û kurê wê yê herî biçûk jî 65 salî ye. Ewaş Baqî bi eslê xwe ji bajarê Rihayê ye. Beriya 34 salan hevserê Ewaş Baqî çûye ser dilovaniya Xwedê. Tu pirsgirêkên tenduristî yên dayika Ewaş Baqî heta niha tune ne.
Dayika Ewaş Baqî niha dem bi dem rastî pirsgirêkên hiş û jibîrkirinê tê, lê çûna xwe ya bakurê Kurdistanê tu carî ji bîr nake û diyar dike ku di dema çûna wê de sînor di navbera rojava û bakurê Kurdistanê de tune bûn.
Şopên deqan li ser rûyê Ewaş Baqî yên dema ciwantiya wê de hê jî li ser rûyê wê diyar in. Dayika Ewaş diyar kir ku dema wê rûyê xwe deq kiriye nayê bîra wê. Ewaş Baqî car bi car hêdî hêdî dimeşe.
Dayîka Ewaş Baqî dibêje ku heta niha wê nexweşxane nedîtiye û tu pirsgirêkên wê yên tenduristî tune ne û ew dermanên xwezayî bi kar tîne, her wiha piraniya dema xwe di malê de derbas dike.

**EWAŞ BAQÎ DÎROK E**

Ewaş Baqî diyar dike ku dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn dest pê kir, ew 16 salî bû û di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de 41 salî bû. Ewaş Baqî dibêje ku di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de çekên otomatîk tune bûn. Ewaş dibêje ku di 55 saliya wê de şoreşa Kubayê pêk hatiye. Her wiha gelek bûyerên tundiyê yên wekî komkujiyên li dijî Ermeniyan, komkujiya Dêrsimê, darvekirina Şêx Seîd û gelek bûyerên din bi bîr tîne.



Ewaş Baqî yek ji kesên herî temenmezine di cîhanê de, bi taybetî piştî ku Jeanne Calmen a 122 salî çû ser dilovaniya Xweda. Sarah Knauss 119, Lucy Hannah 117, Maria Capovilla 116 û Maggie Pauling Barnes 115 salî bûn û hemûyan jiyana xwe ji dest da. Ewaş Baqî niha wek mirova herî mezin di cîhanê de diyar dibe.
Girêdayî temendirêjiyê Ewaş Baqî dibêje ku ew bi jiyana gundewar ve gelekî girêdayî maye û wiha dibêje: "Gelek tişt û bûyer nayên bîra min, lê min giştî jiyana xwe li gund derbas kiriye. Jiyana gundîtiyê temenê mirovan dirêj dike."…*ANHA*

## Hilbijartinên meclisa Kongra Star li 49 navçeyan bi dawî bû

**Melek DEMÎRTAŞ**

Di çarçoveya amedekariyên Kongra Star ji bo li darxistina 2.Konferansê di 1'ê Tîrmehê de dest bi yekemîn hemeleya hilbijartina navçeyan kirin, ku di navbera 10 rojande li 49 nançeyan yên Herêma Cizîrê di 10'Tîrmehê de bi hibijartina 343 endamên bi dawî bû.

**HİLBİJARTİNÊN 49 NAÇEYAN Bİ DAWÎ BÛ**

komîteya amedekar a 2.Konferansa Kongra star di 1'êTîrmehêde dest bi hemelya hilbijartinên navçeyan kirin û di 10'ê mehêde jî bi dawî bû. Di encama hilbijartinê de ku her navçeyek 7 endamên Meclisê avakirin, berdevk, du alîkar û 4 komîte wekî (komîteya aborî, parastin, perwerde û dad civakî hate avakirin. Ev herçar komîteyên serke ne, Meclis di demên pêşde li gorî pêwîstiya navçe dikare komîteyên xwe zêde bike, ku bi giştî 343 endamên meclisê yên navçeyan hatin hilbijartin.

**TEVLÎ BÛNA JİNÊN EREB ZÊDE BÛ**

Hêjaye gotinê ku li 49 navçeyan de piranî netewên ereban tevlîbûn. Tevî ku ev navçeyana dibin bombebarana hişmendiya nejadperest û mêr, her wiha çend salên dawî hişmendiya DAIŞ'ê dijmin û qirkirina mirovahiyê de jiyan kirin, lê tevlî bûna jinan ji civîn û hilbijartina meclisên Kongrê re zêdebûn. Jiber xwesteka wan a şikandian hişmendiya desthilatdar û tolhildana koletiyê hebû, da ku di civakê de xwedî rol û biryar bin.



**ÇİQAS HİŞMENDÎ KOR BÛ EWQASÎ TEKOŞÎNA JİN XURT BÛ**

Navçeyên ku bi tevlîbûn û rêxistin kirina jin bûbû mînak, navçeya Ebdan û Xêra bû. nemûne: ku jinek hevjînê wê nedixwest ku beşdarî hilbijartinên meclisê bibe, lê ew jin bi vîn û tekoşîna biryardariyê karîbû tevlî bibe û cihê xwe di Meclisê de jî girt. Ji ber ku armanca wê diriya meclisa kongra Star de hişmendiya kevnşopî û desthilatdarî bişkîne û jin ji koletiya bedenî û hişmendî xilas bike ev biryar gitr û tevlî bû. Tevkî ku ewqasî jin rastî binpêkirinê hatibûn, ewqasî jî li himberî wê tekoşîn kirin.

**DEST Bİ HİLBİJARTİNÊN BAJAROKAN BİKİN**

Piştî dawî kirina hilbijartinên navçeyan Kongreya Star di 11'ê Trirmehê de li navenda kantona Qamişlo civînek bi boneya nirxandina rewşa hilbijartinên navçe û bajarokan û danûstandina pêngava duyemîn a hilbijrtinên navçeyên herêma Cizîrê li dar xist. Ku li Herêma Cizîrê 20 bajarok hene, 10 li kantona Qamişlo û 10 li Hesekê li ser vê bingehê, dê di 15'Tîrmhê de dest bi pêngava duyemîn a hilbijartinên meclisên bajarokan bikin û heya 20'Tîrmehê bidawî bibe.

**DU KONFERANS BİBİN BİNGEHA KONGREYÊ**

Di 25'ê Tîrmehê li Hesekê û 27 li Qamişlo konferans li darkeve. Ev herdu konferans dê bibin bingeha 2.kongreya Kongra Star ku di meha Tebaxê de ser asta Bakurê Sûriyê li darbikeve, ji bo wê jî duruşmeya wan wê ser asta Bakurê Sûriyê be.
Hêjayî bi bîrxistinê ku 2.Konferansa kongra Star, lê ji ber ku ev cara yekemîne wê li du kantona Qamişlo û Heskê bê li darxistin, bi vî rengî dibe 1.konferans Kongra Star.

## Em ê berxwedanê bidomînin

Dayika Erîfe Osman ku ji ber êrîşên dewleta tirk li Şehbayê bi cih bûye û têkoşîna xwe li wir didomîne got: "Zextên dagirkeran wê nikaribe vîna me bişkîne. Em berxwe didin û em ê berxwe bidin."
Dayika Erîfe Osman a ji Hûlîlêya Efrînê û dayika 10 zarokane. Erîfe ji ber êrîşên dewleta tirk yên li ser Efrînê li Şehbayê bi cih bûye û têkoşîna xwe li wir didomîne.
Erîfê diyar kir ku ew ê heta dawî têbikoşe û hêviya xwe ya vegera Efrînê winda neke.
Dayika Erîfe Osman wiha got: "Ez û zarokên xwe li Gundê Hûlîlîyê dijiyan. Berî ku dewleta tirk êrîşî me bike em bi awayekî ewle dijiyan. Lê piştî ku dewleta tirk êrîş kir em derbasî navenda Efrînê bûn. Lê piştî ku Efrîn jî hat bombebarankirin em derbasî Şehbayê bûn. Dema ku dewleta tirk êrîşî Efrînê kir bû sedema qetilkirina gelek sîvîlan."
Dayika Erîfeyê anî ziman ku ji bo debara xwe bike ew şimikan difiroşe û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Tevî hemû zor û zehmetiyên şert û mercên koçberiyê ez û zarokên xwe em berxwe didin û em hêvî dikin ku dê Efrîn rizgar bibe."… *JINNEWS*



### Komîn -4-



Binevş SARYA

Di beşên bihûrî de em li ser jiyana komîn û pêşketina komînan a di Rojhilata Navîn da rawestiya bun emê di vê beşê de hewil bidin kû li ser pêşketinên komînan yên li Rojava bisekinin. Piştî kû kapîtalîzim li pêş ket û dewlet buyîn her kû berfireh bu. Jiyana komînal her kû çû lewaz bû, heta mirov dikare bêje li hinek deveran ber bi dawî ve çû ye. Wisa didin bawerkirin kû hemû pêşketin malê kapîtalîzmê ye û çavkaniya hemû zaniyariyan welatên Rojavan e. Lê dema mirov li dîrokê dinêre mirov bi awayek vekirî dibîne kû çavkaniya pêşketin û avêtina gavên yekem Rojhilata Navîne. Lê bêguman her dever li gorî dema xwe xwedî pêngavên dîrokî û nirxên mezinin. Têkoşîna li Rojhilata Navîn a ji bo jiyanek komînal bêyî rawestan heta roja îro jî didome. Di her demekê de bi navên cûda û netewên cuda ji bo jiyanek komînal berxwedanî hatine kirin. Ev berxwedanî di roja îro de jî bê navber hîna didomin.
Li deverekî dema kû vîna gelan tune were hesibandin û jiyana civakan were binpêkirin bêguman wê li wir mirov serê xwe ji hemû cure koletiyê re netewînin. Di welatên Rojava de bi pêşketin û mezin bûyîna dewlet netewan re her kû çû jiyana civakî jî ber bi tunebun û talanê ve birin.
Di hemû deman de gelan ji bo azadiya xwe têkoşîn dane maşandin û biryara bi hevre bunê dane. Dema kû li Avrûpa jiyana bajar bûyîn pêşdikeve û rengê civaka bunê lewaz dibe. Gele pêwîstiya xwe bi hevrebunê dibîne ji bo jiyanek Azad li Yunana kevin 15 Konfederesyon ji milê gelan ve tên li darxistin. Di van konfederesyonan de siyaseta girîng tê dîtin û girtina dest mecilsên gelin. Armanca avakirina mecilîsan vînek azad a civakane.
Her kû bajarbûyîn mezin dibin û dikevin bin xizmeta dewlet netewan. Li dijberî wê jî di nava civakan da pêşengên daxwaza jiyan komkomînal jî zêde dibin û têkoşîna jiyana Azad zêdetir tê dayîn. Hîn di 1790'an de dema şoreşa Fransa yê de, konfederesyona gelan tê li darxistin. Di sala 1871'an de komîna Parîsê daxwaza kû hemû komîn di bin banê konfedersyonê de komî gel hev bibin kiriye. Komîna Parîs, di dema şerê fransa-Rusya de kevirên xwe ên bingehîn lêkirine. Komîna Parîs dibe xwedî rolek girîng û dewlet neçar dibin kû hebuna komînê bipejirînin û li gelek deveran endamên komînê dibin rêvebiryên şaredariyên herêman.
Têkoşîna jiyana komîn tenê di Parîs'ê de namîne. Di salên 1905-1917' an de li deverên weke Petersburg, Sovyet, Almanya û hwk din li gelek deveran têkoşîna jiyana komînal tê dayîn. Di encama van têkoşînan de rengê jiyana komînal xwe heta roja meya îro parasti ye.
Li her devera kû têkoşîna jiyana bi hevre buyînê hatiye dayîn li wan deveran wekiheviya nava gelan û ferdan da hîn bi awayek erênîtir hatiye damezirandin.
Hemû civak di wê bawerî û zanebûnê dene kû ger jiyan ne bi hev re be wê tû wateya wê jiyanê tunebe. Di nava hemû candaran da jî candarên herî zêde pêwîstiya wan bi hevrebûnê re heyî mirovin. Ji ber wê tu kes bi tena serê xwe nikare jiyan bike. Tenê buyîn mirina zindî a li ser lingane. Di nava candaran yên herî zêde ji tenê bunê ditirsin mirovin. Ji ber kû hemû mirov baş dizanîn kû tenê bûyîn bi demê re mirovan bi awayek ruhî û zîhnî dikuje.

# Serketin bi 14'ê Tîrmehê misoger bû

***Komîteya Zîndanê ya PKK û PAJK'ê bi boneya salvegera 36 an ya Berxwedana Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê daxuyaniyek da û got, "Di 14'ê Tîrmehê de netewa Kurd bû xwedî rûmet. Rastiya PKK'ê ya ku naşikê beriya 36 salan hat ragihandin. Roja ku rojiya mirinê ya mezin dest pê kir, serketin jî misoger bû."***

Komîteya Zindanê ya PKK-PAJK'ê li ser salvegera 36'an a berxwedana Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê peyamek weşand û diyar kir ku di 14'ê Tîrmehê de neteweya Kurd bûye xwedî rûmet.

Bi navê girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê, li ser çalakiya Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê daxuyaniyeke nivîskî hate dayin. Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku rastiya PKK'ê ya naşikê, beriya niha bi 36 salan bi berxwedana 14'ê Tîrmehê hate ragihandin.

Di daxuyaniya Komîteya Zindanê ya PKK-PAJK'ê de hate gotin, "Bi wesîleya salvegera 36'an a Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê ku neteweya Kurd wê rojê bû xwedî rûmet, di serî de Şehîdên Rojiya Mirinê ya Mezin a 14'ê Tîrmehê em hemû şehîdên Şoreşa Kurdistanê careke din bi minetdarî bi bîr tînin û soza xwe dubare dikin ku em ê heta dawiyê xwedî li kevneşopiya wan a têkoşîna şoreşgerî derkevin. Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê, li dijî kiryarên hovane yên li derveyî mirovahiyê yên faşîzma 12'ê Îlonê, weke serketina mezin a îradeya mirovan derkete holê."


### DI HEDEFÊ DE PKK HEBÛ

Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku Mihemed Xeyrî Dûrmûş, Kemal Pîr, Akîf Yilmaz û Alî Çîçek bi rêya çalakiya xwe nîşan dan ku di nava şert û mercên herî giran de serketin çawa dikare bê bidestxistin, pîvanên milîtaniya Apocî raxistin pêş çavan.

Di dewama daxuyaniyê de ragihandin ku Berxwedana 14'ê Tîrmehê nîşaneya serketinê ya stratejiya şoreşa Kurdistanê ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e û hate gotin, "Vê yekê bi zelalî îspat kiriye ku rejîma 12'ê Îlonê û îradeya mêtinger li pêşberî sekna Apocî têk çûye. Aliyê wê yê herî girîng jî ew e, ku rêbaza serketinê ya li Kurdistanê daye destê gelê Kurd û milîtanên PKK'ê û bi vî rengî bi roleke dîrokî rabûye. Serok Apo gotiye, '14'ê Tîrmehê ji bo gel û milîtanên dixwazin bibin xwedî ruhê PKK'ê û bi ser bikevin, rêbaza têkoşînê ye'. Divê neyê jibîrkirin, cûntaya leşkerî ya 12'ê Îlonê beriya her tiştî xwestiye tovên PKK'ê yên li nava axa Kurdistanê reşiya û şîn bû ji holê rake. Dît ku eger gelê Kurd baweriya bi xwe, îrade û daxwaza têkoşînê ya têkoşîna me ya azadiyê bipejirîne û li ser vê bingehê bikeve nava liv û tevgerê, wê hemû polîtîkayên wan ên 80 salî têk biçin."

### BERXWEDANA LI DIJÎ ÊRÎŞÊN QIRKIRINÊ

Komîteyê bi bîr xist ku li Girtîgeha Amedê bi rêbazên li derveyî mirovahiyê êşkence li kadroyên PKK'ê hatiye kirin û wiha dewam kir: "Cûntaya leşkerî ya 12'ê Îlonê xwest Tevgera Azadiyê li nava dîwarên Zindana Amedê bifetisîne û kadroyên wê teslîm bigire. Êşkenceya li Zindana Amedê û berxwedana li dijî wê hate nîşandan, weke encama polîtîkaya qirkirinê ya dewleta Tirk derkete holê. Berxwedêrên 14'ê Tîrmehê bi gotina, 'em ji jiyanê gelekî hez dikin ku di oxira wê de dimirin' bedena xwe feda kirin û maratona afirandina jiyanê ji mirinê dan destpêkirin."



Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin, roja ku biryar li ser destpêkirina Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê hate dayin, destpêka têkçûna rejîma înkarê ya Tirk e ku dixwest PKK'ê biqedîne.

Di daxuyaniyê de hate gotin, "Bawerî, îrade û rêbaza têkoşînê ya ku bi 14'ê Tîrmehê re hate destnîşankirin, rêbaza serketinê ya di nava şert û mercên herî giran de zelal kir. Roja ku rojiya mirinê ya mezin dest pê kir, serketin jî misoger bû. Kemal Pîr dema bû afirînerê destpêkê yê jiyana nû, wê ji êşkencekarekî re bigota, 'Ez ê li pêşberî we nebêjim of. Hûn ê nikaribin hevokeke bi tenê jî ji devê min derxînin ku pê dilê we rehet bibe. Ez ê nehêlim ku hûn kêfxweş bibin. Çi xweş e azadî'.

M. Hayrî Dûrmûş dema xatir ji hevalên xwe dixwest, wê bigota 'Li ser kevirê gora min binivîsînin 'deyndarê gelê xwe ye' û bi vî rengî wê dest bi rêwîtiya nemiriyê bikira. Wê piştre Akîf Yilmaz bida dû M. Hayrî Dûrmûş. Û 'Stêrka Sor Alî Çîçek' wê li dereng nemabûya. Bi gotina 'Partiya min ne teslîmiyet, lê berxwedan hînî min kir' 17'ê Îlona 1982'an li pey rêberên xwe ber bi rastiyê ve meşiya.

Berxwedana 14'ê Tîrmehê bi zelalî nîşan da ku ewladên gelê Kurdistanê hene ku di nava şert û mercên herî giran de jî poşman nabin û bi hêviya azadiyê ne. Vê berxwedana ev mesaj daye gelê Kurdistanê, 'eger di nava van şert û mercan de mirov dikare li ber xwe bide, hûn jî dikarin li ber xwe bidin û azad bibin'. Gelê Kurd ji nû ve bûye xwedî îrade û baweriya bi xwe. Xeta serketinê ya li Kurdistan û Tirkiyeyê zelal bû û heta dawiyê pêşî li serhildana gelê me vebû."

Di dawiya daxuyaniyê de bang li gelê Kurd, dostan û milîtanên azadiyê hate kirin ku bi ruhê berxwedanê yê 14'ê Tîrmehê têkoşînê geş bikin.

## Bila deriyên Îmraliyê bên vekirin



Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan tecrîda li ser Ocalan nirxand û got: "Çav û guhê milyonan kesan li Îmraliyê ye."

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ê li Grava Îmraliyê ye, ji 27'ê Tîrmeha 2011'an ve bi parêzerên xwe re, ji 11'ê îlona 2016'an ve jî bi malbata xwe re nikare hevdîtin pêk bîne. Malbata Ocalan bal kişand ser tecrîdê û bang li raya giştî û gelan kir ku ji bo başkirina şert û mercên Ocalan tev bigerin.

Birayê Ocalan, Mihemed Ocalan diyar kir ku ji roja Ocalan anîn Tirkiyê û vir ve di bin tecrîdê de radigirin û got: "Hin serdeman tecrîdê nerm kirin. Hin deman jî tecrîdê giran kirin. Ev 19 sal e qet tecrîd nehatiye rakirin."

### DIVÊ DESTÛRÊ BIDIN HEVDÎTINÊ

Ocalan da zanîn ku tecrîda pêk tê ji nîsana 2015'an ve hin girantir bûye û wiha got: "Tenê ez carek çûm hevdîtinê. Hemû serlêdanên me yên hevdîtinê jî ji ber sedemên pûç û vala tên redkirin."

Ocalan bang li hemû civaka navnetewî kir û wiha dewam kir: "Ji bo demokrasî li Tirkiyê bicih bibe û aştî li Rojhilata Navîn mayînde bibe, divê riyên hevdîtina bi Ocalan re bên vekirin. Tecrîd sûcê mirovahiyê ye. Dibe ku hûn polîtîk û siyasî ji Ocalan hez nekin, lê bes ew vîna bi milyonan gel e. Tecrîdkirina kesek vîna bi milyonan û binpêkirina rêgezên hiqûqa navnetewî nayê qebûlkirin. Niha çav û guhê bi milyonan kesî li Îmraliyê ye. Ji 2016'an ve agahî jê nayê girtin. Ji bo gumanên bi milyonan ji holê rabe divê demildest destûr bê dayîn û hevdîtin pêk were."

### TECRÎD BÊ ŞIKANDIN WÊ AŞITÎ PÊK WERE

Ocalan anî ziman ku lazime di serî de gelê kurd û hemû gelên li ser axa Rojhilata Navîn li dijî tecrîdê têbikoşin û got: "Ji bo tecrîda li ser Ocalan bê rakirin divê bi lezgînî bikevin tevgerê. Heta ji destê dewletê tê nagire rojeva xwe. Ev nayê qebûlkirin. Ji bo têkoşîna demokratîk bê li pêşxistin, lazime em tecrîdê bişkînin. Heke tecrîd bê şikandin wê şertên pêkanîna aşitiyê çêbibin. Lewra nifteya aşitiyê di destê Ocalan de ye."

### PÊWÎSTE DERIYÊN ÎMRALIYÊ BÊN VEKIRIN

Xwişka Ocalan, Fatma Ocalan jî axivî û destnîşan kir ku ew ji rewşa birayê xwe Ocalan bifikar e û got: "Em nizanin rewşa tenduristiya wî çawa ye. Ji bo ev fikarên me ji holê rabin, divê deriyên Îmraliyê bên vekirin."

### TECRÎD ŞER KÛR DIKE

Xwarziyê Ocalan, Elî Ocalan jî diyar kir ku tecrîda li ser Ocalan hin bêtir şer kûr dike û wiha got: "Ev nêzîkatî ji aşitiyê re xizmet nake. Heke hevdîtin bi Ocalan re bihatana kirin, wê ev pêvajoya tundiyê jî tunebûya. Ocalan ji bo ku ev rewşa tundiyê derneketa holê wê gelek tiştan bikira. Li gorî min Ocalan di navbera gelên Tirk û Kurd de pira aşitiyê ye. Divê dewlet vê yekê baş bibîne."

Ocalan da zanîn ku lazim e hêzên demokratîk û saziyên navnetewî berpirsyariya xwe bînin cih û şertên li Îmraliyê bên başkirin û riyên hevdîtinê bên vekirin…*MA*

## Wê Îranê ji Sûriyê derxînin



Endamê Desteya Siyasî ya MSD'ê Hikûmet Hebîb diyar kir ku civîna bilind a di navbera Rûsya û Amerîka ku wê pêk were, wê itîfaqan bi xwe re bîne ku bandorê li Sûriyê bike û got: "Wê Îran beranberî ku Rûsya û Rêjîma Sûriyê Idlibê bigirin, ji Sûriyê derkeve."

Endamê Desteya Siyasî ya Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê Hikmet Hebîb pêşketinên dawî yên li Sûriyê û rewşa Tirkiyê nirxand.

Hebîb derbarê rewşa başûrê Sûriyê û derxistina komên çekdar ji başûr ber bi bakurê Sûriyê ve ev tişt anî ziman: "Ji destpêkê ve me got ku herêmên 'Kêmkirina şer" xelatên hin dewleta ne. Tiştê vê yekê isbat dike, niha li başûrê Sûriyê pêk tê. Îsraîl di encama itîfaqa bi Rûsya re rê da ku rêjîma Sûriyê li başûr pêş bike, da ku Îran ji sînorê xwe dûr bixe. Li gorî daneyên heyî diyar e ku di navbera Amerîka û Rûsya de itîfaq heye bi vê yekê jî dixwazin Îranê ji dosya Sûriyê derxînin. Rûsya ev soz daye Amerîka û Îsraîlê, ev yek jî wê bibe sedema nakokiyan di navbera Rûsya û Îranê de."

Hebîb, derbarê helwesta wan wekî MSD'ê jî diyar kir ku ew hêvî dikin li başûrê Sûriyê çareseriyek dûrî kuştin, wêraniyê pêk were û wiha dewam kir: "Em hêvî dikin ku sivîl neyên kuştin. Komên navê opozisyonê li xwe kirine, fam kirin, ku ew ê nikaribin li dijî rêjîma Sûriyê û Rûsya şer bikin. Lê wan asta daxwazên xwe bilind kirin û ji ya xwe daneketin, ev jî ji ber ku ew bi derve ve girêdayîne û ne xwediyê biryarê ne."

Hikmet Hebîb di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser civîna bilind a di navbera Rûsya û Amerîka ku tê payîn di rojên pêş de were lidarxistin û ev tişt anî ziman: "Civîna Rûsya û Amerîka wê bandorê li rewşa Sûriyê bike. Amerîka wê sozê ji Rûsya bigire ku Îranê dûrî Sûriyê bixe, beranberî wê dê Rûsya û rêjîm destê xwe deynin ser Idlibê."

### EM JI DIYALOGÊ RE AMADE NE

Hebîb, derbarê danûstendinan de jî diyar kir ku ew ji danûstendinên Sûrî-Sûrî re amade ne û wiha dewam kir: "Ji bo pêkanîna hêviyên gelê xwe, em ji danûstendinan re amade ne, armanca me avakirina sîstemek demokratîk ne navendî ku mafê hemû gelê Sûriyê biparêze. Di vê meha pêşiya me de, wê Kongreya MSD'ê were lidarxistin, em bi rêbazek nû dest bi tekoşînê bikin, da ku em danûstendina di navbera hemû gelê Sûriyê de pêş bixin. Tekane riya çareserkirina hemû aloziyan danûstendin in."

Endamê Desteya Siyasî ya MSD'ê Hikmet Hebîb di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku têkiliyên di navbera Rûsya û Amerîka taktîkîne û ne stratejîke û got: "Hikûmeta AKP'ê jî beşek ji projeyên wan ên nû yên di herêmê de ne. Bi taybetî piştî ku sîstema desthildariya Tirkiyê kirin desthildariya serokkomar. Ev jî wê bibe sedema ku aloziya hundirîn kûrtir bibe, bi taybet piştî têkçûna aboriya Tirkiyê, ev yek ji aliyê her kesî de tê dîtin."… *ANHA*



# Li ser Firatê danûstandin hene

***Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Îlham Ehmed ji bo ku karmend û pisporên Bendava Feratê vegerin bi rêveberiya bendavê re bixebitin dan û standin di navbera berpirsên rêjîmê û rayederên rêveberiya herêmî ya Tepqayê de hene. Ehmed got, "xêr û berên Sûriyê yên hemû gelên Sûriyê ne û mafê her kesî ye sûdê jê bibîne.***



Îlham Ehmed da zanîn ku ji bo vegerandina karmend û pisporên Bendava Firatê da ku bi rêveberiya bendavê re kar bikin, danûstandin di navbera berpirsên rêjîma Sûriyê û berpirsên meclisên herêmî yên Tebqayê de heye.

Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Îlham Ehmed têkildarî gotegotên ku di demên dawîn de derbarê herêma Tebqayê de têne gotin, axivî.

Îlham Ehmed diyar kir ku ji bo çareserkirina pirsgirêkên wan bi rêjîmê re wan tu carî rêya leşkerî bi kar neaniye, berevajî wan diyalog bikaranîne û got: "Lê dema em rastî êrîşê hatin me parastina xwe kir. Tiştekî normal e ku danûstandin di aliyê xizmetguzarî de ji bo gelê me were destpêkirin. Me berê jî gotibû xêr û berên Sûriyê yên hemû gelên Sûriyê ne û mafê her kesî ye sûdê jê wergire."

Îlham Ehmed derbarê danûstandinên ku niha bi rêjîmê re têne kirin de ev tişt got: "Niha danûstandin tenê di asta herêmî de têne kirin, ango danûstandin di navbera berpirsên saziyên xizmetguzarî yên rêjîmê û berpirsên meclisên herêmî û saziyên xizmetguzariyê yên Tebqayê de heye. Ev danûstandin jî tenê di çarçoveya vegerandina karmend û pisporên berê yên Bendava Firatê de ye da ku bi rêveberiya bendavê re ya girêdayî Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê bixebitin."

Hevseroka MSD`ê Îlham Ehmed tekez kir ku danûstandinên bi vî rengî tiştekî xwezayî ne, ji ber ku gelê Sûriyê jê sûdê werdigire û dibe ku ji bo tiştên din ên xizmetguzariyê danûstandin dewam bike.

Îham Ehmed derbarê dosyaya ewlekariyê de diyar kir ku ev dosyayeke gelekî hesas e û girêdayî dozên neteweyî û pêkanîna demokrasiyê ye û ev jî ne girêdayî mijarên danûstandinên ku niha têne kirin û wiha got: "Tiştên ku têne gotin ku wê careke din "çargoşeya ewlekarî" ango hêzên ewlekariyê vegerin, ji rastiyê dûr e."…*ANHA*

## Fener



### A Deraa jî çû!

Idrîs HENAN

Li başûrê Sûriyê li bajarê Deraa di sala 2011an de çirûska şoreşeke gelêrî vêket. Di pêvajoya heşt salan de bi sedhezaran mirovên Sûriyeyî jiyana xwe ji dest dan, bi duqatî wan jî astengdar bûn û bi milyonan jî koçber û penaber bûn. Gelê Sûriyeyê wê çaxê hêvî nedikir ku şoreş ewqas sal bajo. Digot qey mîna gelên Tunis, Misir û Lîbyayê wê di çend roj û mehan de dîktatoriya heyî biherife. Lê bayê berjewendiyan ê li Sûriyê ketiye ne nola yê van welatên navborî bû. Mewziya Sûriyê ya ceosiyasî jî ne dişibî wan welatan. Ji ber vê hîna şoreş di hilînê de bû dewletên herêmî û yên navneteweyî dest avêtinê û têk birin. Lê hêviyên gelê Sûriyê mezintir bûn. Her li riyên çareseriyê digeriya û pêvajoya xwe ya serîhildana li hemberî zilmê bi bedelên giranbuha dewam kir.

Çima asta mudexeleya nava Sûriyê ne weke welatên dîtir bû? pirsek ku bersiva wê rastiya şerê li Sûriyê û herêmê diqewime rave dike.

Sûriyê li navenda bazirganiya hersê parzemînên Asya, Ewrûpa û Afrîqyayê bi cih dibe. Amerîka û hinek dewltên rojavayî ji bo ku pêdiviya wan bi gaza Rûsyayê nemîne, bi serweriya xwe li ser Sûriyê dixwazin xeta gazê ji welatên kendavê heya Ewrûpa di Sûriyê re bikişînin. Ev yek wê him hewceya wan ji gaza Rûsî re bê tesîr bike, him jî wê bandora Rûsyayê ya siyasî lawaz bike. Her wiha cihê Sûriyê ku li bakurê Filistînê ye, çilekiya hegemoniya navdewletî ji bo pêkanîna planên xwe di herêmê de zêde dike. Ev xalekî wê ya bi hêze ku girîngiyeke ceosiyasî dide Sûriyê. Ev ji bilî dewlemendiya wê ya bin erd û ser erdê ye. Dîsa ji bo gelên herêmê Sûriyê navendeka şaristaniyan e ku bi muzayîka gelên xwe hêza herî bi bandor di Rojhilata Navîn de ye.

Sûriyê ji ber vê girîngiya xwe ya ceosiyasî bû armanca çavkuriya hemû aliyan. Bi riya mudexeleya van aliyan jî naveroka vê şoreşê têk çû û veguherî bobelatek ku li ser serê gelê Sûriyeyê bariya. Ango Sûriyê serdema şerê qiral, kilîse û zanistê ya sedsalên navîn a Ewrûpayê dijî.

Li Sûriyê isbat bû ku her bizav û tevgera pala xwe nedabe paşxaneyek ideolojîk ku têde azadî, demokrasî, edalet û wekhevî pîvan bin, şoreş nayê hesibandin. Endamên wê ji ber bêçareya xwe ya fikrî û siyasî heman ji hêzên derve re dibin desteka herî wefedar. Dagirkirina axa Sûriyê bi destê van kesên Sûryeyî jî vê yekê isbat dike. Dagirkirina Efrînê jî mînaka herî rezîlane ya serpêhateyên van hêzan e. Van hêzên ku ev heşt salin cilê şoreşgertiyê li xwe kirine, dawiya dawî de paytexta xwe Deraa jî radestî rejîmê kirin. Li vir ferq û cudahiya fikra ku Berxwedana Serdemê li Efrînê û qaşo paytexta "şoreşa Sûriyê" Deraa bi rê ve dibir, derdikeve. Îsbat bû ku berxwedana pala xwe daye paradîgmaya Şoreşa 19 Tîrmehê li Rojava û Bakurê Sûriyê tekane şoreşa rasteqîn a gelên Sûriyeyê ye. Gelên Rojava û Bakurê Sûriyê bi ideolojiya pêşeng a Netewa Demokratîk xwedî hêza çareseriyê û berxwedanê ne. Di her dem û mekanî dikare dagirkeriyê têk bibe, lê Deraa "tevî hejmara mezin a çek û cebilxanê, cureyên pêşketî yên çekan û piştgiriya bê sînor a hêzên navneteweyî" "mixabin" ji ber nebûna pêşengtiyeke ideolojîk çû û hate radestkirin.

## 29 sal derbasbûn lê kujerên Qasimlo nehatine darizandin

Lîderê Kurd Dr. Abdulrehman Qasimlo, 13'ê Tîrmeha 1989'an li Viyanayê dema bi du hevalên xwe re bi rejîmê re li dora maseya danûstandinan rûniştibû hate kuştin. Di ser vê sûîqestê re 29 sal derbas bûn, lê hîn kujer nehatine darizandin.



22'ê Çileya 1946'an dema ku li meydana Çarçira ya Mahabadê Komara Kurdistanê hate ragihandin Ebdulrahman Qasimlo 16 salî bû. Xwendekarek bû ku xwe ji bo zanîngeha li Tehranê amade dikir. Qasimlo di 14 saliya xwe de bû endamê baskê ciwanan ê partiya Komunîst Tûdey. Hilweşîna Komara Mahabadê, darvekirina Qazî Mûhammed li Çarçira û girtina bavê xwe li Tehranê bihîst.

Van bûyeran bandora xwe li ser jiyana Qasimlo jî kir. Partiya sosyalîst a ku di sala 1948'an de li Çekoslovakyayê hate ser hikum, ciwanên Tûdeyî vexwend welatê xwe. Di nav van ciwanên Îranê de tenê Kurdek hebû, ew jî Ebdulrehman Qasimloyê 18 salî bû. Rojên wî yên li Pragê dest pê kir.

Qasimlo di sala 1957'an de li Zanîngeha Pragê êdî bûbû hîndekar. Piştî bêdengiya 20 salan a Mehabadê, li Rojhilatê Kurdistanê di sala 1967'an de, di Newrozê de hinek ciwanan li hemberî rêveberiya Şah Pehlewî bi derfetên biçûk dest bi berxwedanê kirin.

Di sala 1973'an de Qasimlo bû sekreterê Paritiya Demokrat a Kurdistanê ya Îranê (PDK-Î). Slogana wî ya kongreyê de jî ev bû, "Ji Îranê re demokrasî, ji Kurdistanê re otonomî."

Qasimlo dema di 1976'an de vegeriya Pragê û piştre jî li Parîsê bi cih bû. Ligel seroktiya PDK-Î li zanîngeha Sorbonê ya Parîsê bû doktor û li vê derê ders da. Di Mijdara 1978'an de dema rejîma Şah Pehlevî hilweşiya, Qasimlo vegeriya Kurdistanê.

Di 1'ê Sibata 1979'an de wê balafira Hûmeynî ji Parîsê biçûya Tehranê. Di havîna 1978'an de Qasimlo çend caran çûbû serdana Hûmeynî û hin soz jê stendibû. Piştî ku Hûmeynî çû Îranê û piştî 10 rojan şoreşa xwe îlan kir, ji Kurdan re digot, "Ez ê we bibînim."

Lê Hûmeynî di 28'ê Adarê de bi heyeta Kurdan re civiya û bi ti awayî nêzî muzakereyan nedibû. Digot "Di îslamê de Kurd, Azerî, Fars, netewe tune. Em hemû ji ummeta Xwedê ne." Qasimlo jî di qadan de digot, "Em Kurd ji xayînên xwe re dibêjin cehş, ji îro pê ve yê ku baweriyê bi gotinên Hûmeynî bîne 'cehş' e. Ma we çi zû îxaneta 1975'an ji bî kir?"

Di 17'ê Tebaxa 1979'an de Hûmeynî ji bo Qasimlo got, "Ew dijminê Xwedê ye." Di nîvê duyemîn ê sedsala 20'an de yek ji mezintirîn qirkirin li ser Kurdistanê dihate ferzkirin. Wê wextê herî kêm 10 hezar Kurdên sivîl hatin kuştin.

### DANÛSTANDINÊN BI REJÎMA TEHRANÊ RE

Şerê Îran û Iraqê yê di sala 1980'î de qedera Rojhilatê Kurdistanê guherand. Şerê heta sala 1984'an bi giranî domiya, nêzî 10 hezar pêşmergeyan jiyana xwe ji dest dan. Qasimlo jî baregeha xwe biribû çiyayê Qendîlê. Di nîveka sala 1980'an de bi qasidiya serokê YNK'ê Celal Talabanî bi Tehranê re têkilî danî.

Herdu alî cara pêşîn di 30'ê Kanûna 1988'an de li mala Xebat Marûf ê YNK'yî li hev civiyan. Civînê du rojan dewam kir. Qasimlo ji daxwaza "Perwerdehiya bi Kurdî, bila Kurdî bibe zimanê duyem ê fermî" daneket. Piştî mirina Hûmeynî Rafsancanî hate dewsa wî û muzakereyan dîsa dest pê kir.

Vê carê Fadil Resûl bû qasid. Resûl li Viyanayê dijiya û lobîvanekî Kurd bû. Hevdîtinên serokên Kurdan wî amade dikir.

Qasimlo dixwest hevdîtin li Parîsê be. Îraniyan jî digotin "Ya Viyana yan jî Berlîn. Parîs nabe". Qasimlo di 11'ê Tîrmehê de çû Viyanayê.

Dr. Qasimlo beriya hevdîtina 13'ê Tîrmehê ya bi Îraniyan ji Wezareta Karê Hundir ê Avûstûryayê ji bo saet 16.00'an randevû stendibû. Lê sekreterê wezîr got ku randevû hatiye betalkirin. Kitekita herî krîtîk ev e ku, hevdîtin çima hatiye betalkirin û wê Dr. Qasimlo çi ji hikumeta Avûstûryayê re bigota.

Randevû wê di saet 17.30'an de li rêya Lînken Bahngasse ya li herêma sêyemîn a Viyanayê pêk bihata û Fadil Resûl cihê hevdîtinê eyar kiribû.

Di vê demê de sê Îranî; Cafer Sahraroodî, Mustafa Ajvadî û Amîr Mansoûr Bozorgîan ji otêlê derketibûn û gihaştibûn cihê civînê. Di bêrîkên wan de pasaportên dîplomatan hebûn û 10'ê Tîrmehê hatibûn Viyanayê. Piştre şahidê wê rojê yê bi navê xwe yê kod 'Şahid D' wê bigota, Mahmût Ehmedî Nejad ku 2005'an wê bibûya serokkomar jî bi wan re bûye û keşf kiriye. Hemû alî li maseya hêwanê rûniştibûn û danûstandinê dest pê kiribû. Danûstandin li ser bandekê dihate tomarkirin. Piştre ji wê bandê wê dengê Qasimlo bihata bihîstin ku polîsên Avûstûryayê ew band deşîfre kiribûn. Qasimlo digot: ''Hem ez ê destvala vegerim û hem jî ez ê bibêjim Îranê li ser otonomiya ku sond xwariye dixebite? Ez nikarim wiha bikim.'' Piştî gotinan dengê guleyan…

Bi guleyên ku ji du çekan derketî Qasimlo ji enî, cênîk û stûyê xwe, Resûl jî ji qoqê serê xwe û stûyê xwe wê derb dixwe.